

ESKE

Evaluation des compétences scolaires en langue première

KURDE KURMANJI

Série de tâches de 7 à 9 ans d'expérience scolaire

Pädagogische Hochschule FHNW 2021 / Haute école pédagogique FHNW 2021


Professur Deutschdidaktik und Mehrsprachigkeit im Kindesalter / Chaire de didactique de l'allemand et
du plurilinguisme chez l'enfant

Erk

1. Nivîsê bixwîne û pirsên girêdayî wê bibersivîne.

Cîpsên kartolan

Cîpsên kartolan tenik in, sorkirina qetên kartolan û dîtina vî tiştî digihêje sed sala 19an. Di derbarê vê yekê de gelek agahî hene. Kê ev dît û ji bo firotinê bi kar anî? Hema hema ne mumkun e mirov zanibe bê serikê çîroka vê yekê çawa dest pê kiriye. Çîroka herî zêde belav bûye ya aşpêj George Crum e ku di sala 1853an de ji bo dilê muşteriyekî xwe xweş bike, kartolan tenik jê dike, di nava rûn de sor dike û xwê pê wer dike. Encam: Muşteriyekî dilnexweş, dibe muşteriyekî pir dilxweş. Dibe ku ev vegotin rast be, lê belê em



dizanin ku aşpêjên din jî di van salan de li ser heman tiştî hizirîne. Heman berhem di nav gelek pirtûkên aşpêjî yên amerîkanî de cih girtine û li Îngilîstanê jî hatine pêşdebirin. cara yekem di sala 1890î de, cîpsên kartolên sorkirî li dikanan hatin firotin, lê belê firotina wê ya gelemperî ya bi awayekî rêk û pêk, heta dîtina mekîneya sorkirinê ya dawiya salên 1920î domiya. Pişt re di salên bi pey re de, pakêtkirina wan li pêş ket ku karibin bi tibabeke mezin ji Amerîkayê bişînin derên din. Firotina wê ya li Ewropayê, di salên 1950î de dest pê dike.

Nivîskar ev nivîs ji bo çi nivîsiye?

- Ji bo ku xwendekaran di derbarê çîroka cîpsên kartolan de agahdar bike.
- Ji bo çîrokeke kêfxweş bide ber xwendekaran.
- Ji bo pêş xwendekaran bike bê mirov çawa cîpsên kartolan çêdike.

Gelo em dizanin bê kê cîpsên kartolan dîtîye?

- Belê, ew George Crum bû.
- Na, dibe ku kesên cuda cuda bûn.
- Na, lê belê em dizanin bê *li ku* hatiye dîtin.

Kê zêde em dizanin bê cîpsên kartolan kengî hatine dîtin. rast

çewt

Cîpsên kartolan destpêkê li Ewropayê hatine firotin. rast

çewt


Gelek sedemên cuda hene ku di sed sala 20. de mirovan her dem cîpsên kartolan xwarine. rast

çewt

2. Li jêrê tê nivîseke kin û çar diyagramên rewşa hewayê yê li ser çar bajarên cuda bibîn. Nivîsê bixwîne, li diyagraman binêre û ji kerema xwe re bi devkî bêje bê ew li ser çî ne.

Germahî û baran

Li hinek cihên cîhanê havînê gelekî şilî dibare, li cihên din hema hema nabare. Li hinek herêman tevahiya salê germahî hema hema wekî hev dimîne. Li herêmên din di navbera Havîn û Zivistanê de gelekî cudahî heye, wekî li Swîsre. Çar bajarên di diyagraman de hatine şanîdan li parzemînan cuda cih digrin û xwediyê rewşa hewayê yê cuda ne. Hanoi li Vietnamê ye, Tûnis, paytextê Tûnis ê li behraspî ye, Dublîn li Îrlanda û Jakutsk li nava Rûsya ye.



Figur 1: Diyagrama hewayê ji şemaya şilî û şemaya germahiyê bi hev re pêk tê. Şilî li aliyê çepê bi awayê mîlîmetrê tê şanîdan, germahî li aliyê rastê bi santîgrad dereceyan tê şanîdan. Diyagram rewşa şilî û ya germahiyê ya hema hema ji meha Çile heta meha Kanûnê didin diyarkirin.

3. Pirsên nivîsa „Germahî û baran“ê

A. Li nivîs û diyagraman ên di erka 2. de binêre û bajarê rast ê di tabelayê de xêz bike.

	Hanoi	Tûnis	Dublîn	Jakutsk
Di seranserîya salê de germahî di navbera 5-15 dereceyan de diçe û tê.				
Li vî bajarî Havînê kêr dibare û bi Gulanê re heta Cotmehê germahî dibe 20 derece ango zêdetir.				
Ji Cotmehê heta Nîsanê dikare berf bibare.				

B. Li diyagrama bajarê Jakutskê ya di erka 2. de binêre û li vir bersiva rast xêz bike.

Rewşa hewayê di Mijdarê de li Jakutskê

Kêr zêde 0 derece germahî û 20 mm dibare	<input type="checkbox"/>
Kêr zêde -10 derece germahî û hema hema 55 mm dibare	<input type="checkbox"/>
Germahî hema hema di bin 10 dereceyan re ye û 60 mm dibare	<input type="checkbox"/>
Hema hema di ser -30 dereceyan re germahî heye û 15 mm dibare	<input type="checkbox"/>

C. Li kîjan bajarên di navbera baran û germahiyê de bi pirahî guhertin çêdibe, li gorî diyagramên di erka 2. De, bajarên rast bixe nav giroverokê.

Baran herî zêde li vî bajarî tê guhertin:

Hanoi	Tûnis
Dublîn	Jakutsk

Germahî herî zêde li vî bajarî tê guhertin:

Hanoi	Tûnis
Dublîn	Jakutsk

4. Her du nameyan bixwîne û bi kinahî bi devkî bêje, bê li ser çî ne.

Nameya 1, Nav 1

Li şûna şîr, avê bidin zarokan

Şîrê çêlekan ên li dibistanan ne xwezayî ye. Li ser ruyê cîhanê mirov cinsê yekem e ku şîrê cinsên din vedixwe.

Xebateke zanyarî wê vê çarşemê di rojnameyê de were weşandin. Li wê derê wê were nîşandan ku dema vexwarina şîrê çêlekê derbas bûye. Ev xebat diyar dike ku fêdeya wê ya jiyânî kêr e û xisara wê ji bo şikestina hestiyên heye.

Şîrê çêlekê ne xwezayî ye û ne jî ji bo tenduristiya gel û derdorê fêdeya wê heye. Ji ber vê yekê, dema wê ye ku zarokên xwe fêrî hînbûniyên nû yên dostê xwezayê bikin: Ji bo zarokên li dibistanê têhniya xwe bişikînin, avê bidin wan.

Herbert Müller

Rêveberê saziya „xwarina ji şînatîyê“

Nameya 2, besiva ji birêz Herbert Muller re

Şîr ji bo xwarina nîvro ye

Herbert Muller naxwaze ku zarok li dibistanê şîr vexwin. Saziya min û Dewletên Yekbûyî li dijî vê yekê şanî didin ku: hemû zarok divê li dibistanê belaş şîr bistînin.

Di hundirê şîr de 18 ji 22 mîneralên bikêrhatî hene ku rojane pêwîstiya me bi wan heye û ev yek ji bo zarokên li dibistanê bi awayekî qenc bi xwedî û mezin bikin pêwîstiyek e. Lêkolînên nû diyar dikin ku zarok gava li dibistanê şîr venexwin, mîneralên bikêrhatî jî têr nastînin.

Ula Rosander pispora xwedîkirinê ya Zanîngeha Kristianstad a Swêdê, xebatek li ser sê dibistanên Swêdî meşand. Li her sê dibistanan heman xwarina nîvro hat dayîn, lê tenê li dibistanekê şîr li kêleka xwarina nîvro dan zarokan.

Tecrubeyan diyar kir ku ji bo hemû zarokên hindik xwarinê dixwin ango ji bo xwarinê dema wan kin e, şîr ji bo sitendina kalsiyûmê, Vitamîna B12 û Magnezyûmê pêwîst e. Ji ber vê yekê li dibistanê pêwîstiya me bi dayîna şîr heye.

Susanne Pfister

Nûnera saziya „Pro Bauer“

5. Ji bo her du nameyên di erka 4. de vegotina rast xêz bike.

a) Birêz Pfister, çima grîng dibîne ku zarok li dibistanê şîr vexwin?

- Zarok gava şîr vexwin, zêdetir xwarinê dixwin.
- Tiştên di nava şîr de temen(imir) dirêj dikin.
- Di nava şîr de gelek mîneral hene.

b) Çima birêz Muller dixwaze zarok avê li şûna şîr vexwin?

- Av ji şîr erzantir e.
- Av ji bo xwezayê çêtir e.
- Av çêtir têhniyê dikuje.

c) Li gorî nameyan lêkolîn çi diyar dikin?

- Şîr dikare bandoreke erênî jî, neyênî jî bike.
- Di nava warinên li dibistanê de ji xwe bê şîr jî têra xwe mîneral hene.
- Şîr hestiyar xurtir dike.

d) Çima birêz Pfister nameyê dinivîsîne?

- Ew dixwaze diyar bike bê çima birêz Mûler ne mafdar e.
- Ew dixwaze diyar bike ku av ji bo derûdorê bi fêde ye.
- Ew naxwaze ku zarokên dibistanê kêmbixwin.

e) Birêz Muller dixwaze bêje ku gava em rast
pir zêde şîr vexwin, temenê jiyana me çewt
kintir dibe.

f) Birêz Muller û Pfister nîşa didin ku her rast
du name jî xwediyê heman tecrubeyê çewt
ne.

g) Zanyar li ser bandoriyên vexwarina şîr rast
xwediyê heman nêrîne ne. çewt

6. Ji her du nameyên di erka 4 de zêdetir baweriya te bi kîjan nameyê tê? Bi devkî hinekî di derbarê wê de bipeyive bê ji bo çî.

7. Li şemayê binêre û pirsan bibersivîne.

Nico 15 salî ye û diçe pola 9. Roja çarşemê paş nîvro ew li restorantekê wekî şagirt dixebite. Di dema xwe ya vala de ew ji lîstina bi goga lîngan hez dike. Ji we re bernameya wî ya heftane:

	Duşem	Sêşem	Çarşem	Pêncşem	În
7.45-9.15	zim.bi.2	zim.bi.1	mat.	zim.bi.2	zim.bi.1
9.15-9.45	<i>navber</i>	<i>navber</i>	<i>navber</i>	<i>navber</i>	<i>navber</i>
9.45-11.15	mat.	erdn.	zan.xw.	zan.xw.	dîr.
11.15-12.00	mat.	erdn.	zim.û w.	zim.û w.	zim. û w.
12.00-13.30	<i>navbera nîvro</i>	<i>navbera nîvro</i>	<i>navbera nîvro</i>	<i>navbera nîvro</i>	<i>navbera nîvro</i>
13.30-15.00	zim.bi.1	dîr.	zim.bi.1	zim. û w.	wer.
15.00-15.30	<i>navber</i>	<i>navber</i>		<i>navber</i>	<i>navber</i>
15.30-17.00	zim. û w.	wer.		mat.	muz.
17.00-18.00			xebat		
18.00-19.00			xebat		
19.00-20.00	goga lîngan		xebat	goga lîngan	
20.00-21.00	goga lîngan		xebat	goga lîngan	
21.00-22.00			xebat		

Awayê kinkirî

zim.bi. 1	1. zimanê biyanî (Englisch)
zim.bi. 2	2. zimanê biyanî (Französisch)
erdn.	erdnîgarî
dîr.	dîrok
mat.	matematîk
muz.	muzîk
zan.xw.	zanista xwezayê
zim. û w.	ziman û wêje
wer.	werzîş

Pirs

1. Nico di hefteyekê de çend dersan dibîne?

bersiv: _____

2. Kîjan beşa dersê, Nico di hefteyê de tenê carekê dibîne?

bersiv: _____

3. Kîjan beşa dersan, Nico berya bêhdana nîvro nabîne.

bersiv: _____

8. Nivîsekê li ser rêzikên liv û tevgera mirovan binivîsîne, ji bo zarokên ji malbata te ne (mînak, gelo zarok dikarin bi tena xwe biryarê bidin, ka kengî biçin nav nivînan). Bi vê sedemê pirsên li jêrê bibersivîne:

- Di nav malbata te de ji bo zarokan kîjan rêzik hene?
- Ji vana kîjanê tu hişmend dibînî, kîjan ne hişmend e û ji ber çî?
